RÊVEBERIYA XWESER
LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ
DESTEYA PERWERDE Û FÊRKIRINÊ

# FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

## SERETAYÎ

## 5









2019/2020

# FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

## SERETAYÎ

## 5

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Zimanê Kurdî ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

MIZGÎN Û DIBISTAN ........................................................ 8
HEVNASÎN ........................................................................ 10
ÇÛNA DIBISTANÊ ............................................................ 12
MAMIK ............................................................................. 19
NASÎNA KES Û TIŞTAN ..................................................... 22
CÎNAVKÊN ŞANÎDANÊ YÊN XWERÛ ..................................... 23
PAQIJÎ .............................................................................. 23
Lİ KES Û TİŞTAN PİRSÎN ................................................... 27
CÎNAVKÊN PIRSYARIYÊ .................................................... 28
KÎ ÇÛ, Çİ KIRÎ? ............................................................... 29
EM BİXWÎNİN GUHDAR BİKİN .......................................... 30
MAMIK ............................................................................. 32
KÊZIKA ÇIRÇIRK Û MORÎ ................................................ 34
KAR Û PÎŞE ..................................................................... 44
BIXWÎNIN Û GUHDAR BIKIN ........................................... 45
LÎSTOK ............................................................................ 46
PAQIJIYA XWEZAYÊ ....................................................... 52
ÇÛNA ŞANOYÊ ............................................................... 58
ROJ ................................................................................. 61

TIŞTÊN NEBAŞ NAKE ................................................ 64
BARAN .......................................................................... 66
DEMSAL ........................................................................ 67
NAVÊ HIN TIŞTAN NAS BIKIN ................................... 72
KER Û GUR ................................................................... 74

# BEŞA 1

**Av, dilop bi dilop, dibe gol.**

# MIZGÎN Û DIBISTAN

Roj baş roj baş hevalno

Rabin ji xewa dilano

Vaye vebû dibistan

Em fêr bibin zimanê xwe

Ezber bikin tîpên xwe

Nas bikin dîroka xwe

Dîroka me ya dewlemend

Hemû saz û bend

Pir xweş e awaza me

Bi dengê mamosteyê me



**Rofend Elumer**

Weke tê zanîn, di refa çarê de em fêrî tîpên kurdî bibûn. Me nas kiribû ku çawa ji tîpan kite çêdibin. Her wiha, ji kiteyan peyv pêk tên û mirov dikare ji peyvan jî hevokan saz bike.

## TÎPÊN KURDÎ:

**Aa- Bb- Cc- Çç- Dd- Ee- Êê- Ff- Gg- Hh –Ii -Îî- Jj- Kk- Ll- Mm- Nn- Oo- Pp- Qq –Rr -Ss- Şş- Tt- Uu- Ûû-Vv- Ww- Xx- Yy- Zz**

## Tîpên dengdêr: **Aa Ee Êê Ii Îî Oo Uu Ûû**

- Hevoka li jêr, bi awayekî rast bixwîne.

Jina Rojava, cihê xwe di her qada jiyanê de girtiye.

- Hevoka li jêr, bi awayekî xweş binivîse.

Em bi biratiya gelan re ne.

- Hevoka li jêr, kite bike.

Em ji mamosteyê xwe hez dikin.

.................................................................

# HEVNASÎN

Roj baş! Navê min Casim e.

Nave te çi ye?

Roj baş! Navê min Bêrîtan e.





Navê wê çi ye?

Navê wê Rîma ye.

Navê wî çi ye?

Navê wî Kendal e.





**Casim:** Roj baş! Navê min Casim e. Navê te çi ye?



**Bêrîtan:** Roj baş! Navê min Bêrîtan e.

Di zimanê kurdî de du cureyên cînavkên kesane hene.

**Ji ber ku em van cînavkan li cihê navan bi kar tînin, em ji wan re dibêjin; "cînavk".**

## 1- Cînavkên kesane yên tewandî:

| | |
|---|---|
| Min | **Navê min Sibhî ye.** |
| Te | **Navê te Şîlan e.** |
| Wî | **Navê wî Botan e.** |
| Wê | **Navê wê Hediya ye.** |
| Me | **Navê me Sebah û Mezlûm in.** |
| We | **Navê we Hîbe û Zeyneb in.** |
| Wan | **Navê wan Arîn û Xedîce ne.** |

# ÇÛNA DIBISTANÊ

- Roj baş xwendekarno, ez ji Rojava me. Ehmed tu ji kîjan bajarî yî?
- Ez ji Girê Spî me.
- Hevala te ji ku derê ye?



- Ew ji Kobanê ye.
- Tu bi xêr hatî.
- Spas
- Ev hevalên din ji ku derê ne?
- Ew ji Şedadê ne,
- Hûn bi xêr hatin.
- Spas xwendekarno, ka em bi hev re biçin dibistanê.
- Hêêêêêêêê...

## 2- Cînavkên kesane yên xwerû ev in:

**Ez – Tu – Ew – Em – Hûn – Ew**

### Mînak:

- **Ehmed ji ku derê ye? Ew ji Girê Spî ye.**
- **Hevalên din ji ku derê ne? Ew ji Şedadê ne.**

### Hevokên li jêr bixwîne:

Ez ji Rojava **me.**

Tu bedew **î.**

Ew mamoste **ye.**

Em xwendekar **in.**

Hûn jêhatî **ne.**

Ew karker **in.**

# Pêvekên Kesane

| Cînavkên kesane yên xwerû | Pêvekên kesane |
| --- | --- |
| Ez | **im/me** |
| Tu | **î/yî** |
| Ew | **e/ye** |
| Em | **in/ne** |
| Hûn | **in/ne** |
| Ew | **in/ne** |

- Weke ku li jor derbas bû, du rengên pêvekên kesane hene. Diyarkirina wan, li ser bingehê tîpa dawî ya peyva beriya wan e. Dema ku tîpa dawî ya peyvê dengdar be; (**im, î, e, in**) tên bikaranîn, lê dema ku tîpa dawî ya peyvê dengdêr be; (**me, yî, ye, ne**) tên bikaranîn.

**Mînak:**

**Dema ku dawiya peyvê dengdar be:**

| | | |
|---|---|---|
| Ez | xwendekar | im. |
| Tu | | î. |
| Ew | | e. |
| Em | | in. |
| Hûn | | in. |
| Ew | | in. |

**Dema ku dawiya peyvê dengdêr be:**

| | | |
|---|---|---|
| Ez | mamoste | me. |
| Tu | | yî. |
| Ew | | ye. |
| Em | | ne. |
| Hûn | | ne. |
| Ew | | ne. |

**TÊBÎNÎ: Pêvekên kesane; dema ku bi lêkeran re werin bikaranîn, pêve tên nivîsandin. Lê dema ku bi navan re werin bikaranîn, jê cuda tên nivîsandin.**

# HÎNDARÎ

## 1- Vê hevpeyvînê, bi hev re bixwînin.

**Şiyar:** Dem baş! Navê min Şiyar e. Navê we çi ne?

**Nûra:** Navê min Nûra ye.

**Hêlîn:** Navê min Hêlîn e.

**Sabir:** Navê min Sabir e.

**Elî:** Navê min Elî ye û navê hevalên min Cabir, Helîma û Canê ye.

## 2- Valahiyên li jêr dagire.

**Mustefa:** Roj baş! Navê ............ çi ye?

**Diyar:** Roj baş! Navê ............ Diyar e. Navê ........ çi ye?

**Mustefa:** Navê ........... Mustefa ye.

**Diyar:** ......... ji ku derê .......?

**Mustefa:** ....... ji Til Temir ........., lê tu?

**Diyar:** Ez ji Gir Zîro ......... .

## 3- Cînavkên kesane yên xwerû, di nava hevokan de bi kar bîne.

## 4- Cînavkên kesane yên tewandî, binivîse.

## Destûrên Ziman

**1- Di hevoka li jêr de hêmaya pirsê hatiye bikaranîn.**

**Miha delal, tu dikarî hinek hirî bidî min?**

Dema ku em bixwazin pirsekê bikin, em ê di hevoka xwe de peyva pirsyarî bi cih bikin û bi hêmaya pirsê bi dawî bikin.

**Mînak:**

Hevalê hêja, tu **çi** karî dikî**?**

**2- Peyvên li jêr, di nava hevokan de bi kar bîne.**

**baran** **ba** **ewr**

- Taca zêrîn e, ser serê her kesî nîne.

  (**Aqil**)

- Hûr hûr barî, hey hey barî, spî kir her çar alî.

  (**Berf**)


# BEŞA 2


## GOTINÊN WATEDAR

**Pirtûk, derya jiyanê ye.**

# NASÎNA KES Û TIŞTAN



## CÎNAVKÊN ŞANÎDANÊ YÊN XWERÛ

| Ev (nêzîk) |
|---|
| **Ev pênûs e.** (yekjimar/mê û nêr) |
| **Ev pênûs in.** (pirjimar/mê û nêr) |
| |
| **Ew (dûr)** |
| **Ew çiya ye.** (yekjimar/mê û nêr) |
| **Ew baxçe ne.** (pirjimar/mê û nêr) |

## PAQIJÎ



Xwendekarên dibistana Şehîd Rûbar sibehan zû radibin. Ew dest û çavên xwe dişon û berê xwe didin dibistanê. Di rê de rastî min hatin. Yekî ji wan got; ev dibistana me ye. Dema ketin dibistanê di destpêkê de çend komik çêkirin. Ew bi karê paqijiyê rabûn, mamosteyên wan jî bi wan re alîkarî kirin. Ew bi hev re kêfxweş bûn.

## PIRS

1- Xwendekaran sibehê zû çi kirin?
2- Çima xwendekaran dibistana xwe paqij kirin?
3- Çima divê em derdora xwe paqij bihêlin?
4- Hûn jî dibistana xwe paqij dikin, yan na?

## HÎNDARÎ

**1- Peyvên li jêr, di nava hevokan de bi kar bîne.**

**Ew, Ev**

**2- Bi çend hevokan, xwe bide naskirin.**

..............................................

..............................................

..............................................

..............................................

..............................................

**3- Tîpên li jêr, bi awayê xemilandî di lênûsa xwe de binivîse.**

## Tîpên Mezin

**A B C Ç D E Ê F G I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z**

## Tîpên Biçûk

**a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z**



# Destûrên ziman

- **Hevok, bi tîpa mezin dest pê dike.**

  **Mînak:**

  **Zimanê dayîkê xweş e.**

- **Xal ( . ) li dawiya hevokan tê bikaranîn.**

  **Mînak:**

  **Parastina welat, erkekî mirovî ye.**

# Li kes û tiştan pirsîn

Ew kî ye?

Ew Cîhan e.



Ev çi ye?

Ev kursî ye



Ev çi ne?

Ev çêlek in?



# CÎNAVKÊN PIRSYARIYÊ

## Kî

Tu **kî** yî? Ez Yara me.

Ew **kî** ye? Ew Ciwan e. (yekjimar)

Ew **kî** ne? Ew Macid û Dîlan in. (pirjimar)

## Çi

Ev **çi** ye? Ev lênûs e. (yekjimar)

Ev **çi** ne? Ev jêbir in. (pirjimar)

Ew **çi** ye? Ew dep e. (yekjimar)

Ew **çi** ne? Ew çente ne. (pirjimar)

# KÎ ÇÛ, ÇI KIRÎ?



Heyat çû sûkê, hinek pêdiviyan bîne malê. Di rê de rastî Macid hat, piştî ku li hevûdu pirsîn, derket ku Macid jî diçe sûkê. Heyatê dikir hinek bacanên sor bikire, lê buha bûn. Lê belê ji xwe re nekir pirsgirêk û got:

- Ma qey jiyan bê bacansor nabe! Macid jî tevlî bû û got; bi ya te ye. Divê mirov li gorî derfetan jiyan bike.

## PIRS

1- Kî çû sûkê?

2- Heyatê kî di rê de dît?

3- Heyatê dikir, çi bikire?

4- Macid ji Heyatê re çi got?

## Em Bixwînin Guhdar Bikin

Mijarê ji mamosteyê xwe guhdar bikin. Dema hûn guhdar dikin, bila çav û guhên we li mamoste bin.

Bi tiştên weke pênûs û jêbiran nelîzin.

Dema hûn bêdeng dixwînin, lêvên xwe nelivînin. Di mejiyê xwe de bixwînin.

Di xwendina bideng de hewl  bidin da ku hûn jî weke mamoste bixwînin.

**1- Navê mirovan, bi tîpa mezin dest pê dikin.**

## Mînak:

Dijwar – Sena – Çeleng – Berxwedan

**2- Xêzika axaftinê, ( - ) di destpêka axaftina kesekê/î de tê bikaranîn.**

## Mînak:

Elî ji bavê xwe re got:

- Bavo tu yê kengî biçî welêt?

**MIJARA SERBEST**

# MAMIK

1- Xatûneke kiras reş, tama devan dike xweş.

(**Beroş**)

2- Sêniya cam, tejî mercan.

(**Ezman û stêrk**)

3- Xatûna çil kezî, li pişt malê dibezî.

(**Mirîşk**)

## Ka em navê hinek tiştan nas bikin:




Ferheng




Pirtûk



Zebeş



Masî



Kîso




Gîtar



Gok



Dika şano



Jimartek



# KÊZIKA ÇIRÇIRK Û MORÎ

Kêzika çirçirk havînê tim dikir kêf û şahî, tembûra wê di dest de distra ta êvarî. Bi stran û govend roj dibuhirand, lê zivistana sar û seqem netanî bîra xwe.

Moriya xebatkar, ji biharê ta payîzê bi şev û roj kar dikir, ji bo zivistanê amadekariyên xwe dikir.

**Havîn qediya, payîz hat**

**Di pey wê re zivistan**

**Ji berfê spî bûye**

Deşt û çiya û zozan

Dinya bû sar û serma

Her tişt di bin berfê de ma

Kêzika me ya çirçirkê

Bê xwarin û bê qût ma

Çû ber qût û xwarinê

Ma te çi kir havînê?

Min demê xwe bihurand

Her bi tembûr û stran

Ê de baş e, niha jî

Bigire govend û dîlan.

# PIRS

1- Çima kêzika çirçirk zivistanê bê xwarin ma?
2- Çima morî havînan bêrawestan kar dikir?
3- Divê mirov weke kêzika çirçirk, yan jî weke moriyê be?

# BEŞA 3

GOTINÊN WATEDAR

Azadiya jinê, azadiya civakê ye.

## **Hevokên li jêr bixwîne**:

Xwendekar li dibistanê ne.



Zarok **ji** malê derketine.





Gul **di** guldankê de ne.

Ez **bi** meşê diçim dibistanê.



# Daçek:

Bi serê xwe tu wateyê nadin, lê hevokan ji aliyê wateyê ve sergihayî dikin. Daçek ne xwediyê wateyekê ne, lê ji ber ku xwediyê peywirekê ne, weke peyv tên pejirandin.

## Daçekên bingehîn:

## Ji, bi, li, di

### Ji:

**Mînak:**

- **Em ji Rojava ne.**
- **Ez ji welatê xwe hez dikim.**
- **YPG û YPJ'ê herêm ji çeteyan paqij kirin.**

### Bi:

**Mînak:**

- Ew bi hevalên xwe re diçe dibistanê.

- Ahîn bi meş diçe mala hevala xwe.

## Li:

**Mînak:**

- Ceger li gund dijî.
- Sadiq li benda nûçeyan bû.

## Di:

**Mînak:**

- Mezlûm di fêrgehê de ye.
- Em di komîsyona werzîşê de ne.

## HÎNDARÎ

**- Cihên vala, bi peyvên guncaw dagire:**


Sîpan ……… Amûdê ye. Dema ku …….. dibistanê derdikeve ……… hevalên xwe re diçe mal. …….. rê de …… wan re ….. ser waneyên ku birine gotûbêj dike. ….. wan re dibêje; divê em bi qasî waneyên xwe …….. stranan jî guhdarî bikin.

# Li ku derê ye?

Kursî, **li rex** mêzeyê ye.



Pênûs, **li ser** mêzeyê ye.



Pisîk, **di bin** mêzeyê de ye.




Pisîk, **di** selikê de ye.



- Ew **ji bin** darê derket.



- Xwendekar **bi hev** re li ser pirsan lêkolîn dikin.



- **Li gorî hevokên li jor, bersiva pirsan bide.**

**1-** Çi li ser mêzeyê ye?

________________________________

**2-** Çi di selikê de heye?

________________________________

**3-** Çi di bin mêzeyê de ye?

________________________________

**4-** Çi li rex mêzeyê ye?

________________________________

**5-** Kî ji bin darê derket?

________________________________

**6-** Xwendekar bi hev re çi dikin?

________________________________

# DESTÛRÊN ZIMAN

**1- Nav û paşnavên mirovan, bi tîpa mezin dest pê dikin.**

**Mînak:**

Nermîn Silêman

Şervan Cengîz

**2- Tîpa destpêkê ya hevoka li jêr, çawa hatiye nivîsandin?**

**Mînak:**


Têra xwe ava hênik vexwar.

# KAR Û PÎŞE

**Ez peristar im.**



**Ez nanpêj im.**




**Ez bijîşk im.**



**Ez mamoste me.**



**Ez hosta me.**



## BIXWÎNIN Û GUHDAR BIKIN

Dema hûn bêdeng dixwînin, çavên xwe fêrî xwendina bilez bikin.

Mijarê bi dengekî xwezayî bixwînin.

Di xwendinê de hay ji van xalên li jêr hebin.

- Tilî û pênûsa xwe li ser rêzikan negerînin.
- 
- Serî û destên xwe nelivînin.

# LÎSTOK

Lîstin bi xwe werzîş e, sûdên wê gelek in. Hinek ji wan ev in: Di warê tenduristiyê de mirov ji nexweşiyan diparêze.

Her wiha, dema mirov bi hevûdu re dilîze, hevaltiya mirov xurt dibe û kêrhatinên wan jî pêş dikevin. Niha, hûn û lîstokek ji bo we.

**Veşartok**

**Akif** : Hevalno, ka em veşartokê bilîzin?

**Ferhat**: Erê, em bilîzin.

**Şerîfe**: Ez jî dilîzim.

**Cemîle**: Ez ê jî bilîzim.

**Akif**: Baş e, pêşî kî ji me, wê bibe pîra holikê?

**Ferhat**: Werin pîra holikê, em bi "bizdim-badim"ê diyar bikin!

Bizdim

Badim

Şeşkim

Kêşim

Yek - Du - Sê

Akif bû pîra holikê !!!

(Akif berê xwe da dare, çavên xwe girtin û hevalên wî xwe veşartin)



Veşartok

- Ooooooo

  Êkê mêkê

  Girka çûkê


  Şah bilbilê

  Textê çilê
  Çil çîzanê
  Ava rengê hezareyê
  Gur gureyê
  Bîst li te yê
  Xwe veşêrin, va hatim we!


# Lîstokên me




Veşartok



Teyt



Darqîtik



Xar

## Heye/Hene



Li ser mêzeyê çenteyek heye.

Li ber malê darek tune ye.

Li ber paceyê zarokek heye.

Li ser darê çivîkin hene.

Di pirtûkxaneyê de pirtûkin hene.



Di fêrgehê de xwendekar tune ne.

Li ser mêzeyê du pênûs hene.

# Pêvekên nebinavkirinê:

| |
|---|
| **-ek: (yekjimar/mê û nêr)**<br>Mînak:<br>**Zarokek, pirtûkek, pênûsek, darek** |
| |
| **-in: (pirjimar/mê û nêr)**<br>Mînak:<br>**Zarokin, pirtûkin, pênûsin, darin** |

## HÎNDARÎ

**1- Li gorî hevokên li jor, pirsan bibersivîne.**

**1-** Li ser mêzeyê çi heye?

______________________________________________

**2-** Li ber paceyê kî heye?

______________________________________________

**3-** Di pirtûkxaneyê de çi hene?

______________________________________________

**4-** Di fêrgehê de çend xwendekar hene?

______________________________________________



**2- Li gorî wêneya li jor, cihên vala bi heye/hene dagire:**

1- Du nivîn ______________.

2- Avîzeyek ______________.

3- Sê gulopên şevê ______________.

4- Du pace ______________.

5- Paldankek ______________.

6- Du balîf ______________.

7- Televîzyonek ______________.

# PAQIJIYA XWEZAYÊ



Rojekê ez û hevalê xwe, em bi hev re çûn seyranê. Me buxçikek bi xwe re bir. Di buxçikê de hinek xwarin hebû. Piştî ku em di nava xwezaya xweş û bedew de geriyan, me herduyan bi hev re xwarina xwe danî û xwar.

Piştî me xwarina xwe bi dawî kir, me tûrek ji çenteyê xwe derxist û qirêjî xiste tûr. Ji bo ku hem xweza qirêj nebe û hem jî eger kesin hatin vî cihî, bi paqijiya cih kêfxweş bibin.

# PIRS

1- Dema xwendekaran xwarin xwarin, çi ji qirêjiyê kirin?

2- Divê mirov çi bike da ku xweza paqij bimîne?

3- Ger xweza qirêj bû, wê çi bibe?

# BEŞA 4

**PENDÊN PÊŞIYAN**

Heta kefa dest reş nebe, tama dev xweş nabe.

# Çalakiyên Rojane



Ez dixwînim.



Ez dilîzim.



Ew wêneyekê çêdike.



Ew li pêşengehê digerin.



Ew nameyê dinivîse.



Tu li tembûrê dixî?

## DEMA NIHA

**Mînak:**

| Lêker (rader) | Dema niha |
|---|---|
| Xwarin | Dixwe |
| Nivîsandin | Dinivîse |
| Lîstin | Dilîze |
| Firîn | Difire |
| Kenîn | Dikene |

# Çûna Şanoyê



Asmîn, Fadil û Cûdî îro diçin Rimêlanê li şanoyê temaşe bikin.

**Asmîn**: Şano li ser çi ye?

**Fadil**: Li ser cîrantiyê ye.

**Cûdî**: Baş e, jixwe li taxa me cîranekî me Suryan û yê din jî Ereb e, em ji hev pir hez dikin.

**Fadil**: Em gazî Semîra jî bikin?

**Asmîn**: Semîra bi malbata xwe re diçe gundekî ku cîranê wan e.

**Cûdî**: Dema me dibore, em herin.

# HÎNDARÎ

## 1- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişîne.

**Egîd** : Cîhan, tu li ku derê yî?

**Cîhan:** Ez li mala Hêlînê me. Rojda û Diyar jî li vir in.

**Egîd** : Baş e. Hûn çi _____________ (kirin)?

**Cîhan:** Ez û Hêlîn li waneya dîrokê ___________ (xebitîn). Rojda nameyekê ____________ (nivîsîn). Diyar jî rojnameyê ____________ (xwendin). Tu jî ____________ (hatin)?

**Egîd** : Erê, ez jî _____________ (hatin). Gelo xwarin heye?

**Cîhan:** Erê, diya Hêlînê ji me re xwarinê ____________ (çêkirin).

**Egîd:** Baş e. Ez jî ava fêkiyan ____________ (anîn).

**2- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişîne.**

**1-** Xelat sêvekê _____________. (xwarin)

**2-** Tu çayê _____________? (vexwarin)

**3-** Azad _____________ dibistanê. (çûn)

**4-** Em li fîlmekî temaşe _____________. (kirin)


**5-** Em _____________. (gerîn)

**6-** Rojda gulan _____________. (çinîn)

**7-** Pelên daran _____________. (weşîn)

**8-** Ez cilan _____________. (şûştin)

# Roj



**Bawer:** Ez ê çend pirsan li ser rojê, ji te bipirsim.

**Hêlîn:** Kerem bike.

**Bawer:** Roj çend demjimêr e?

**Hêlîn:** Bîst û çar demjimêr in.

**Bawer:** Roj çend dan in.

**Hêlîn:** Pênc dan in.

**Bawer:** Danê yekem kîjan e.

**Hêlîn:** Sibeh e. Sibeh, destpêka rojê ye û her kes diçe ser karê xwe.

**Bawer:** Danê duyem kîjan e?

**Hêlîn:** Nîvro ye. Nîvro dema firavînê ye.

**Bawer:** Danê sêyem kîjan e?

**Hêlîn:** Berêvar e. Berêvar, di navbera nîvro û êvarî de ye.

**Bawer:** Danê çarem kîjan e?

**Hêlîn:** Êvar e. Êvarî roj diçe ava, her kes diçe mala xwe.

**Bawer:** Danê pêncem kîjan e?

**Hêlîn:** Şev e. Şev, dema bêhnvedan û razanê ye.

**Bawer:** Her bijî Hêlîn.

**Hêlîn:** Spas

## HÎNDARÎ

1-Roj çend demjimêr e?

2-Danê sibehê mirov çi dike?

3-Berêvar, dikeve navbera kîjan danên rojê?

4- Danê şevê mirov çi dike?

5-Girîngiya demê çi ye?

# TIŞTÊN NEBAŞ NAKE

1- Eyhem xwezayê qirêj nake.



2- Ez neynûkên xwe dirêj nakim.



3- Ez destên xwe qirêj nahêlim.



# Neyîniya Dema Niha

Neyîniya dema niha, bi alîkariya pêvekên (**ni, na**) pêk tê.

**Mînak:**

Ez **na**xwim**.**

Kîso **ni**kare bifire.

Xedîce avjeniyê **na**ke.

Ew bi zimanê îngilîzî **ni**zane.

**Têbînî:**

Neyîniya dema niha; bi (**na**, **ni**) çêdibe.

# BARAN



Ewrek hate asmanî

Baranek gel xwe anî

Rijande serê çiya

Şînkirin gul û giya

Tev newal û der û deşt

Xemilandin mîna bihişt

De ka rabin cotyaran

Bikêlin tev beyaran

Tu lezke û bilezîne

Warê xwe bixemilîne

Baranê lêke lêke

Xetîra jînê pêke

**Azad Mizûrî**

# DEMSAL




## BIHAR

**Cîlan:**

Navê min Cîlan e.
Ez ji biharê hez dikim.
Bihar demsaleke xweş e.
Hewa germ dibe û baran dibare.
Zarok, li kolanan bûka baranê digerînin.
Di biharê de gul û giya şîn dibin.
Dar kulîlk vedikin.
Xweza geş dibe.




## HAVÎN



**Samir:**

Navê min Samir e.
Ez ji havînê hez dikim.
Havîn demsaleke germ e.
Di havînê de berên zeviyan çêdibin.
Mêwe digihêjin, sebze zêde dibin.
Ez ji avjeniyê hez dikim.

## PAYÎZ



**Bêrîvan:**
Navê min Bêrîvan e.
Ez ji payîzê hez dikim.
Payîz demsaleke hênik e.
Di payîzê de pelên daran zer dibin û diweşin.

Germahî kêm dibe, serma hêdî hêdî zêde dibe û şilî dest pê dike.

## ZIVISTAN



**Çekdar:**
Navê min Çekdar e.
Ez ji zivistanê hez dikim.
Zivistan demsaleke sar e, lê bi min xweş e.
Şev dirêj dibin.
Berf û baran dibarin.
Zarok kalê berfê çêdikin.
Ez bi hevalê xwe re li ser berfê kaşûn dikim.

# HÎNDARÎ

1- Havîn demsaleke çawa ye?

2- Di biharê de çi vedibin?

3- Di payîzê de rengê pelan çawa ye?

4- Di biharê de hewa çawa dibe?

5- Zivistan demsaleke çawa ye?

6- Tu ji kîjan demsalê hez dikî?

## DESTÛRÊN ZIMAN

- **Çima navên li jêr, taybet in?**

"Dêrik, Efrîn, Kobanê, Til Hemis, Til Berek, Qamişlo"

1. **Ji navên ku tenê ji bo heyînekê tên bikaranîn re, "navên taybet" tê gotin.**

2. **Navên taybet, bi tîpa mezin dest pê dikin.**

## NAVÊ HIN TIŞTAN NAS BIKIN




Odeya razanê



Odeya rûniştinê




Odeya zarokan




Xwaringeh

**Tîpên li jêr, di lênûsa xwe de binivîse.**



# KER Û GUR


Hebû tunebû, carekê ji caran, li dora gundekî kerekî bêxwedî hebû. Pir şerpeze bûbû. Ji ber ku heçî karekî wî hebûya, bi wî kerî dikir û heçî ku barekî wî hebûya li wî dikir. Ker hingî ji karê xelkê bêzar bûbû, hema ji xwe re bi ser çiyê ve hilkişiya.



Di rê de rastî roviyekî hat.

**Rovî:** Ho kero, tu yê biçî ku?

**Ker:** Quzulqurta bavê kero!



**Rovî:** Lê bêjim çi?

**Ker:** Bêje; "kerê bi kurtanê zer, sêniyek ceh li ber."

**Rovî:** Kerê bi kurtanê zer, sêniyek ceh li ber, diçî ku?

**Ker:** Ez ji ber gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve hildikişim.

**Rovî:** Ma tu min bi xwe re nabî?

**Ker:** Ma çima nabim?

Her du bi hev re çûn û bi rê de rastî beranekî hatin.


**Beran:** Ho kero, tu yê biçî ku?

**Ker:** Quzulqurta bavê kero!

**Beran:** Lê bêjim çi?

**Ker:** Bêje; "kerê bi kurtanê zer, sêniyek ceh li ber."

**Beran**: Kerê bi kurtanê zer, sêniyek ceh li ber, diçî ku?



**Ker:** Ez ji ber gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve hildikişim.

**Beran:** Ma tu min jî bi xwe re nabî?

**Ker:** Ma çima nabim?

Ker, rovî û beran bi hev re çûn û di rê de rastî dîkekî hatin.

**Dîk:** Ho kero, tu yê biçî ku?

**Ker:** Quzulqurta bavê kero!

**Dîk:** Lê bêjim çi?



**Ker**: Bêje; "kerê bi kurtanê zer, sêniyek ceh li ber."

**Dîk:** Kerê bi kurtanê zer, sêniyek ceh li ber, diçî ku?

**Ker:** Ez ji ber gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve hildikişim.

**Dîk:** Ma tu min jî bi xwe re nabî?

**Ker:** Ma çima nabim?



Ker, rovî, beran û dîk bi hev re çûn û di rêya xwe de rastî kîvroşkekî hatin.

**Kîvroşk:** Ho kero, tu yê biçî ku?

**Ker:** Quzulqurta bavê kero!

**Kîvroşk:** Lê bêjim çi?

**Ker:** Bêje; "kerê bi kurtanê zer, sêniyek ceh li ber."

**Kîvroşk:** Kerê bi kurtanê zer, sêniyek ceh li ber, tu yê biçî ku?

**Ker:** Ez ji ber gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve hildikişim.



**Kîvroşk:** Ma tu min jî bi xwe re nabî?

**Ker:** Ma çima nabim?

Ker, rovî, beran, dîko û kîvroşk bi hev re çûn, bi rê de **kerî got:** Gelî hevalan, zira min tê, divê ku ez bizirim.

**Hevalên wî jê re gotin:** Malava, tu yê çawa bizirî, em di navsera vî çiyayî de ne, gurin wê bi me bihesin, wê me hemûyan bixwin.

**Ker:** Nabe, ya dawî divê ku ez bizirim.

Kirin û nekirin, ker razî nebû. Kerî serê xwe bilind kir dest bi zirînê kir: Ahîîî, ahîîî, ahîîî!

Li devereke nêzî wan heft gur hebûn. Wan dengê ker bihîstin. Her heftan, ji hev re gotin: Gelo ev çi deng e tê?

**Yekî ji wan got:** Ka ez herim, bê ev çi deng e?

**Hevalên wî gotin:** De here.

Gur hat dît ku ker û hevalên xwe di navsera çiyê de di nava mêrgê de ne, bêxwedî ne, hema kêfa wî hat û ew ber bi wan ve çû.



Ji pişt ve çû û xwe avêt nava teşkên kerî. Hema ker her du rehnên xwe li stuyê gurî şidandin û ew zeft kir. Beran ji pişt ve bi poçan rabûyê.

Dîk çû ser pişta kerî bang da. Rovî erd kola. Kîvroşk da xapa. Bi vî awayî, hingî beranî li gur da, ew bêhiş xist.

Piştî ku wan gur berdan, ew nîvmirî çû cem hevalên xwe. Hevalên wî, jê pirsîn: Birako, te çi dît?



**Gurê jevketî got:** Birano, qet deng mekin. Ez çûm min miletek li wê derê dît, kes nebîne.

**Wan meraq kir û gotin:** Çawa?

**Wî got:** Gava ku ez çûm, hema serê min kirin nava du latan û bi du mêkutan li nava pişta min dan. Yekî ji wan yasîn li ser min dixwend, yekî dida xapan, li kefenê min digeriya. Yekî jî hema gora min dikola.

Gava guran ev gotin bihîstin, tirs ket dilê wan û hemûyan bi hev re ji wî cihî bazdan û gotin:

Gidî, spas ji Xweda re ku em ji lepên wan rizgar bûn.

Çîroka min li diyaran,
rehme li dê û bavê guhdaran,
ji bilî fesadên ber dîwaran.

**PIRS**

1- **Çima ker ber bi çiya ve hilkişiya?**

2- **Hevalên kero kî bûn?**

3- **Çima guran ji wir bazdan?**

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Hefte / Meh | Hefteya Yekem | Hefteya Duyem | Hefteya Sêyem | Hefteya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| **Rezber** | | | MIZGÎN Û DIBISTAN | HEVNASÎN |
| **Cotmeh** | ÇÛNA DIBISTANÊ | MAMIK | NASÎNA KES Û TIŞTAN | CÎNAVKÊN ŞANÎDANÊ YÊN XWERÛ |
| **Mijdar** | PAQIJÎ | LI KES Û TIŞTAN PIRSÎN | CÎNAVKÊN PIRSYARÎ | KÎ ÇÛ, ÇI KIRÎ? |
| **Berfanbar** | EM BIXWÎNİN, GUHDARÎ BIKIN- MAMIK | KÊZIKA ÇIRÇIRK Û MORÎ | DAÇEK | LI KU DERÊ YE? |
| **Rêbendan** | KAR Û PÎŞE- BIXWÎNIN, GUHDAR BIKIN - LÎSTOK- LÎSTOKÊN ME | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| **Reşemeh** | HEYE/HENE | PAQIJIYA XWEZAYÊ | ÇALAKIYÊN ROJANE | ÇALAKIYÊN ROJANE |
| **Avdar** | ÇÛNA ŞANOYÊ | ROJ | TIŞTÊN NEBAŞ NAKE | TIŞTÊN NEBAŞ NAKE |
| **Cotan** | BARAN | DEMSAL | NAVÊ HIN TIŞTAN NAS BIKIN | KER Û GUR |
| **Gulan** | KER Û GUR | NIRXANDIN | | |